# Hevrêtiya Derûnî-Civakî li dadweriyê li Navenda Rawêjkariya Jinan a Indigo'yê

Gelo tu bûye goriya kiryareke sûcdariyê û te biryar daye ku vî sûcî ji polîs re ragihînî? Gelo tu tam nizanî ku aniha çi li benda te ye û bêbiryar û çarenûsnediyar î?

Hevrêtiya Derûnî-Civakî li Dadweriyê dikare hevrêtiya te di heyama tevahiya pêvajoya dadweriya sizayî bike, rêyê nîşanî te bide û pişta te di bidestxistina dubare ya aramiyê bigire.

Di hin babetên taybet de mafê te yê qanûnî ya diyarkirina Hevrêtiya Derûnî-Civakî li Dadweriyê bi qebûlkirina lêçûnan ji aliyê dadgehê ve (Xala 406g û Xala 397a ji Rêziknameya Dadweriya Sizayî (stop)) heye. Ev yek dibe ku wek mînak di rewşa ku tu bûye goriya kiryareke sûcdariyê ya giran a zayendî yan şidetê, di meriyetê de be.

Em di warê diyarkirina vê mijarê ku gelo te mafê Hevrêtiya Derûnî-Civakî ya Dadweriyê yabelaş heye û her wiha raberkirina daxwazê bi meraqeke tam alîkariyê didin te.

Raberkirina daxwazê di her demeke dadweriyê de pêkan e.

Frauenberatungsstelle Remscheid

Indigo

Sozialdienst katholischer Frauen e.V.
Bergisch Land

SkF

11-2022 - Kurd

# Hevrêtiya Derûnî-Civakî li dadweriyê li Navenda Rawêjkariya Jinan a Indigo‘yê

Ew babetên xwarê digire ber xwe:

- Zanyariyên têkildarî ragihandina sûcî û pêvajoya dadweriyê, her wiha bijardeyên nûnertiya ji aliyê parêzer ve
- Hevrêtî ji bo ragihandina sûc bo polîs û lêpirsînên zêdetir
- Amadekirina ji bo darizandin û mehkemekirina li dadgehê, wek mînak bi rêya serdana salûna dadgehê û beşdariya di civîna darizandinê li dadgehê
- Derbaskirina demên çaverêtiyê hevrê digel hev li dadgehê
- Piştevanî di warê lêgerrîna ji bo xizmetên alîkarîgihandinê û rawêjkariya zêdetir

Di çarçoveya Hevrêtiya Derûnî-Civakî li Dadweriyê **ti cûre** dadwerîkirina pêvajoya kiryara sûcdariyê û **ti cûre** rawêjkariya mafzanî pêk nayê.

Berpirsa bersivdêr ji bo Hevrêtiya Derûnî-Civakî li Dadweriyê li Navenda Rawêjkariya Jinan a Indigo‘yê:

**Stefanie Maurer**
Telefon: 02191 6966010
Stefanie.maurer@skf-bergischland.de

**Sozialdienst katholischer Frauen e.V.**
**Bergisch Land**

SkF